Gage u bizinege (20160125)

Rûjig le hay rûjele yê kêwanûig bü. Î kêwanûege gayg u bizinig daşt.

Gage u bizinege her rûj eçün e rê çemenzarig u le ûra çemen exwardin, imca wextê şewar e bü gage eçü ew düya e rê teüle ta bidûşyê.

Kêwanûege nan u xûwa eda gagey u ewet e pê: ”Ay gay nazarim, aram bûis ta bidûşimed”.

Düya rûjig bizinege werce gage dewist e rê teülege u wisa le werawer kêwanûege we geLê waz. Kêwanûege we dewrmilîg da le bizinege, imca bizinege le cî xwey tikan nexward. Bizinege xû le hürê bü çün kêwanûge nan u xûwa da gage ta le cî xwey bûisê. Kêwanûege ki dî bizinege naxwazê le cî xwey tikan buxwad çü çûwig bîyerê ta bidad e lê. Bizinege zîyeLigê çü u way. Wextê bizinege daşt edewist, erê girrig indar kird u dî gage le nû nan u xûwa e pê dirya.

Bizinege we xwey wet: “Î dunya edL (dad) e tê nîye. Me le cî xwem tikan nexwardim imca hem xwast bidad e lêm”. Bizinege xirr xward u lûkan (dewist) ew rê teülege, dûLçe (setL) şîrege rijan u şax da le kêwanûege.

Seywan Qember (www.feyli.se) 20160125